# Êrîşên kîmyay yên li ser xwendekarên keç

»»» R:8



# Tirs ji jinê di Şoreşa Jînayê de

»»» R:2

*Bideśtveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (444) 20-04-2023Buha (1000) Tûmen

# Berjewendiya netewî

»»» R:3

# Dîmenên jênosayda dijî jinan li Îrana Islamî de

»»» R:7

# Dawî peyam û wane ji bo rêvîngên rojê

Cihê pê û bandora ber şewq û ronahiya peyam û ders û şîretên Rêberê me yê mezin Dr. Qasimlo li ser rêvîngên rêbaza wî heya niha jî gelek bi başî xuya û berçav in.

Di jiyana siyasî û rêberiya wî rêberê nemir de, hinek vêśtgeh û qonaxên girîng hene ku riśteyek ji peyama wî bûye ronahîder bo rêya rêvîngên wî da ku li ser hêla serraśta xebatê dernekevin, bo mînak yên herî berçav ewin.



Peyama wî ya 11ê Reşemê li Mihabadê, ragihandina xebata aşkera ya PDKÎ.
Peyama wî ya pêşwaziya aştiyaneya 26ê Xezelwera 1358`an hemî Kurdek û xebatkarek têgihand ku ger rê û derfet hebe bo çareseriya aştiyane ya daxwaziyên netewî, hewcehî bi şer û kuştinê nake.

Peyama li dema dawîpêhatina şerê di navbera Îran û Îraqê de ku li demekê de her kes raśtî bê hêvîtiyê bibû û pêşya xwe lêl û tarî didît û hêviyek nemabûn bona domandina xebatê, Rêberê mezin di peyamekê de ragihand ku dawîpêhatina şerê Îran û Îraqê wê derfetê dide me ku em îsbat bikin ku em hêzekî serbixwen e û berî şerê wan me xebat kiriye û piştî şerê wan jî ger em negihîştibin bi armancên xwe, şerê me dê berdewam be, divê her kes bizane ku şerê me çi peywendî bi şerê wan 2 welatan nîne.

Peyama hevxebatiya di gel hêz û aliyên azadîxwaz û netewên bêmaf ên din yên Îranê, Dr. Qasimlo her kes têgihand ku xebat ji bona sernixûniya rejîma Xumeynî hewcehî bi yekîtî û çêkirina bereyekî bihêz ji heçî hêzên demokrat û azadîxwaz û netewên bê maf heye, her çiqas mixabin Kurd û PDKÎ tenê di meydana li hember rejîmê de mabûn.

Peyama li ser qeder û birêveberiya Îranê ku her kes bikare bigehe maf û azadiyên xwe û Îran ya hemî Îraniyan be, dibêje: Me herdu sîśtemên dictator ên Paşayetî û Îslamî ceribandine, û hindî deśtê me bê emê dijayetiya wan 2 dîktatoriyan bikin, û baştirîn sîśtem bo birêveberiya Îranê, tenê sîśtemeke demokratîk , sekolar e ku di şiklê federatî de bikare mafê hemî netewan dabîn bike.

Yek ji peyam û waneyên mamośtayê demokrasî û rêberê me yê mezin , dawî peyam û axivtina wî di roja 29ê Xakelêweya sala 1368`an li nava komek pêşmerge û xebatkarên Hizbê li binkeya Bêşê bû, ku mixabin ev bû dawî peyam.

Dr. Qasimlo ku xwe berhev dike serdana derveyî welat bike û bo vê ku bikare dengê mafxwaziya gelê xwe bigihîne guhê cîhaniyan û bi taybetî weke kareteke bihêziya xebata pêşmerge û gelê Kurd li hember siyaśt û pîlanên rejîmê de bilind biket, di dawî civîna xwe de wiha dibêje û vê peyamê pey xwe bo evîndarên rêbaza xwe bi cih dihêle: Di siyasetê de reş û sipî çinine, an hemî tiştek, an çi ne! Heçî kesê ku wiha siyasetê bike sernakeve.

Bila em îtiraf bikin ku di dîroka netewa me de, siyaseta Kurdan eva bûye, an hemî tiştek, an hîç tiştek, encam bûye çi? Bûye hîç. Di siyasetê de gelek caran mirov 2 pêngavan diçe pêş û tiştekê bi deśt ve tîne, piştre dîsan xebatê dike bo deśtxiśtina tiśteke din, eva siyaseta nav jê danane "Hunera Mumkin" siyaset hunera mumkine, ne yaku mirov bi xeyala xwe tiştekê danê, yaku bi raśtî û bi kiryar cî bi cî dibe ev siyaset e.
Ya din hemî şê`ir û xeyalat e, diyare şê`ir û xeyalat qedexe nine, lêbelê bi şê`ir û xeyalatan siyaset nayê kirin.
Ger çi ev peyam mixabin dawî peyam bû, lê ev peyam û waneya bo heta hetayê di guhê rêvîngên rêbaza Qasimlo de diçinge û şevqê dixe ser rêya wan.

# Tirs ji jinê di Şoreşa Jînayê de



**N. Îsmaîl Şerefî**



Digel berfirehbûna nerizayetiyên cemawerî yên gelên Îranê li dijî dîktatoriyê ku piştî vê ji bo rejîmê derkevt ku bi serkutkirin û çewsandinê nikare îradeya şoreşgiraneya şeqamên welat bi çok de bîne, berpirsên rejîmê bi spartina odeyên hizrî yên xwe hewl dan ku bi awayekê bikevin bi xweşîrînkirin û rêyên fêlbaziyên kevin ên berê bigrin berahîka xwe.

Ev yeka bû ku piştî civîna du roj a her sê dezgehên dewletê yên weke, Dezgeha Dadwerî, Mecilsê bi spartina rêberê nizamên bo vê hewl dan ku bi xeyala xwe li ser vê yekê pêdagîr bûn ku bi binavkirina Şoreşa Jînayê weke alozkerî û têkderiyê hewl dan deriyê rehm û dilovaniyê li ser xelk û aliyên beşdar di vê Şoreşê de vebikin.

Di vê pêwendiyê de, serokê mecilsa rejîmê Qalîbaf di axavtinên xwe de, di mecilsa rejîmê de gotiye, ku di bernameya me de heye ku deriyê diyalogê li ser rûyê rewt û hereketên siyasî yên hundrî welat vebikin û hinek reformên bingehîn jî hebin.

Ji aliyeke din ve, berpirsên dewleta Re`îsî ragihandine ku, polîsê ewlehiya exlaq (Geşda Îrşad) karê vê tê sekinandin, û bi cihê vê organeke nerim dadinên û Muhsen Êjêyî Serokê Dadweriyê jî bi spas ji dil rehmiya Ayetula Xamineyî, mizgîniya azadkirina beşek li "fitneçiyên hatinî xapandin" da bi xelkê.

Berpirsên rejîma Komara Îsamiya Îranê, bi xwe xafilandin ji binyat û daxwaziyên rohn û eşkere yên şoreşê wisa dihesasb dikirin ku, bi hinek hûr paşekêşiyan û nedîtina hinek tiştan dikarin wisa bidin xuyakirin ku dengê xelkê bihîstin e û berewajiyê hinek belgeyên şaş xelkê serhilday bo malên wan radipêçin û şeqam vala dibin.

Lê, her gelek zû derkevt ku ne Komara Îslamiya Îranê bi vê hêsaniyê stûyê xwe bo daxwazkariyên xelkê ku nemana rejîmê û gihîştin bi civakeke azad û nizameke democrat e diçemîne û ne jî xelk ji vê yekê kêmtir ku di heyama wan çend mehan de daxwaz dikin razî dibin û dev ji mana xwe li ser şeqaman ber didin.

Lewra, fazeke din a serkutkirina sîstematîka rejîmê reweteke din li êrîş bo ser xelkê serhilday destpê kiriye, û di meha Reşemehê de pîlana reş a êrîşa jehrîkirina dibistanan destpê kir û di sala nû ya rojî de, bo careke din reftarên serkutkarane yên hêzên ewlehiyê li dijî jinan û keçan li seyrangeh û cihên giştî de bi şêwazeke din xwe derxist.

Eniya vê êrîş û serkutkariyên rejîmê zêdetir li her tex û qadeke civakê, keç û jinên welat in. Yaku rejîm di heyama du mehên borî de bi êrîşên kîmyayî bo ser dibistanên keçan û givaş xistin bi mebesta hicaba bi zorê li ser şeqaman û seyragehan de kiriye, tolhdana rohn û eşkere ya li dijî jin û keçên welat de, ku di şoreş a Jînayê de rola herî pêşengayetî û rêberiya wan hebû û heye.

Rejîmê ku jêra diyar bû ku nikare bi dana hinek poanên xapînok yên bê naverok, xelkê bixapîne û serhildanê ji rê derbixe û asta daxwaziyên xelkê nizim û sivik nîşan bide, pêka binyata hertimî ya xwe tundûtîjtir dest daye bi serkutkirin û tolhidanê kiriye.

Bi armanc kirina keç û jinên welat, jehrîkirina dibistanan, û pêdagîriya tund pêşnimêjên mizgevtan li derheq kincên jinan, rast têgihîştina wan ji binyata Şoreşa Jînayê ye û hêza zêde ya jinan di guherînkariyeke kûr a civakî de ku di vî welatî de destpê kiriye û armancên vê derbasbûna bi tevahî ji bi zimaneke êdolojîkeke olî û pêngav avêtin ber bi cîhaneke azad û demokrat.

Şoreşa Jînayê ku bilî aliyê siyasî yên vê hilgirê guherînkariyeke kûr û bingehîn û civakî ye, ji aliyê bingehîn ve û pêka rêrevîkirin ji berpirsayetiya bi guherînkariya bi şêwaza jiyanê û cîhanbîniya taka civaka îroyî ya welat bo çawaniya tevlîbûna bi cîhana azad û mifahwergirtin ji teknolojî û internet û dîtingehan bo mesrefa wan guherînkariyan û danaberhev a encama reftaran wisa xuya ye ku bi lezgîniya şoreşa sala 1357an Rojî ber bi pêşve neçe.

Lê, ti guman di vê yekê de nine ku bilî ber bi pêşve çûnê û derbasbûn li Komara Îslamiya Îranê ti rêyeke din tuneye.

Lewra, birêveberên Komara Îslamî bitaybet aliyên herî tund yên vê rejîmê niha di rêza herî pêş a rûbirûbûn digel vê şoreşê de ne.

Melayên tundrew li ser tirîbûnên mizgevt û Huseynyan rojane daxwaza çavdêriy tund û reftarên xelkê û bitaybet reftarên jin û keçan in û serdarên şerûd yên Spaha Pasdaran jî bi gefxwarinan, şor û tîran, nîşana gelên nerazî yên welat didin.

Bi armanckirina mijara kincên jin û keçan ku mîna hinek raman bas dikin dibe kêmkirina asta daxwaziyên xelkê ji nemana dîktatoriyê hicab li pişt be, hem bo rejîma Komara Îslamiya Îranê û hem liçav reftarên xelkê ti ji mijarê naguherîn e.

Hemû aliyek baş dizanin ku pirsa sereke ya gelên serhilday yên Îranê yên weke berpirsên rejîmê bi bê rêzî wan binav dikin, tazîbûn nine. Xelk nemana Komara Îslamiya Îranê û gihîştin bi civakeke azad û welatek demokratîk dixwaze.

Di vê qonaxa Şoreşa Jînayê de xebat li dijî hicaba bi zorê cem xelkê nerazî yên welat de, netenê bi wateya kêmkirina asta daxwaziyên bingehîn û jibîrbirina wan nine, belkû rast lêxistin li binyata kevneperesta îdolojîk a Komara Îslamiya Îranê ye û karbideste rejîm bixwe jî vê yekê bi başî fêm dikin. Lewra, bi hemû awayî kevtine canê keç û jinên welat û wisa hesab dikin ku bi êrîşkirina kîmyayî bo ser dibistan û peçatin û sînûrdarkirina şêwaza jiyana wan, dikarin derbê bi pêşengiya Şoreşa Jînayê bixin û jinav bibin.

# Berjewendiya netewî



**N. Nûredîn Sofîzade**

Dema ku bas ji berjewendiya netewî tê kirin, gelek pirsyar tên pêş ku, erê gelo berjewendiya netewî çiye? Çawan tê parastin? Divê kê biparêze? Çawan dikeve ber metirsiyê?

Di dîplomasiyê de û li pênasa modern a berjewendiya netewî de, bi vê armancê tê gotin ku welatek an dewletek li astê navnetewî de ji bona bi destveanîna vê cehdê dike, weke vê ku bikare di karê dîplomasiyê de serkevtinê bi qazancê welatê xwe bidest ve bîne, an li warê abûrî de, an li warê ewlehî de ku bi qazanca xelkê wî welatî tevaw bibe.

Dewletek an deshilatdarên welatekê ger bikarin li siyaset û kiryarên xwe de hind serkevtî bin ku xelkê welatê wan bi sedema siyaseta wan ve rastî arîşe û pirsgirêkên abûrî, siyasî, ewlehî, civakî, tendrustî nebin, mirov dikare bêje deshilatdar û dewleta wî welatî hind hekîmane siyaset kirine ku xelkê welat li çi warekê de bi hegera wan nekevtine ber metirsî, zext û nexweşiyan, hingê em dikarin bêjin el heq deshilatdaran ji bona xelkê welatê xwe ku li heçî warekê de razî bin, karîne berjewendiya netewî ya xelk û welatê xwe biparêzin.

Lê, gava em bên ser pênaseya berjewendiya neteweyekê, hinekê cudahî heye di gel pênaseya siyasî ya ku min serwe amaje pê kir ku deshilatdarên welatan çawan divê berjewendiya xelkê welatê xwe biparêzin.


Netewe dikare dewlet û deshilat û statuya qewara welatekê jî nebe, heçî neteweyekê bixwe hinek berjewendî hene, neteweyek dikare dewlet nebe, lê berxwedana li hember siyaseta asîmîlasyona dujmin û neyarên xwe, bi berjewendiya neteweya xwe bizane, an bi berewajî karê çend kes û girûpekê li nava wê netewê bi qazancê dujmin û dijî berjewendiya netewî bê zanîn û hesibandin.

Bo mînak em wekî netewa Kurd ku mixabin xwediyê deshilat û dewlet û welatê serbixwe ya xwe nînin, lê dîsan jî cuda ji pênasa navnetewî ji bo berjewendiya netewî, me jî wekî neteweyekê berjewendiya taybet bixwe heye.

Kanê em bizanin berjewendiya me Kurdan wekî neteweyeke bê dewlet û welatê serbixwe çiye?
Berjewendiya neteweya Kurdan çawan dikeve ber tirsê û bi ziyana vê netewê dişkê?
Berjewendiya neteweya Kurd çawan tê parastin?

Em wekî Kurd ku aliyê kêm di sed salên derbasbûyî de ji bona bi destxistina mafê netewî û rizgariya Kurdistanê li jêr dagîrkariyê de me xebat kiriye, û di vê xebatê de gelek nirxên mezin hatine dan, hemî ev nirx û qurbanî û şehîd û zextên ku kevtine ser netewa me, tenê li pêxema berjewendiya netewî de bûne û bi rizgarbûn û bi destveanîna mafê netewî bûye da ku Kurd jî weke Ereb, Tirk, Fars an her neteweyeke din bikare bibe dewlet netewe.

Li hember de jî di demekê de ku dujmin û dagîrkarên Kurdistanê dixwazin ji bona vê ku Kurd nekarin bigihîjn bi mafê xwe, siyaseta tune kirina Kurdan girtine bera xwe, ji bona berberekanî di gel wê siyaseta dujminan de, heçî Kurdekê ku berxwe dabe ji bona parastina nasnama netewî, çand û ziman û hebûna Kurdan, ev kes bê guman parêzerê berjewendiya netewî ye, çimkû berjewendiya netewî ya Kurdan tenê xebat ji bona man



û hebûn û bidestxistina mafê netewî ye.

Di nava netewa Kurd de ji bilî vê ku piraniya netewa me di xema xwe parastina li hember dujminan de ye, hinek kes jî tenê bi vê hindê nawestin ku tenê xemxar bin û zanîbin ku berjewendiya netewî çawan tê parastin, belkî ji bona bidestxistina wan mafan e jî ku ji aliyê dujminan ve hatine zevtkirin, şer dikin û amaden e canê xwe jî li vê pêxemê de goriyê berjewendiya netewa xwe bikin.

Ev kesên ku bi her awayekê li hember siyaseta dujminan a tunekirina Kurdan de rawestane, dilê wan bo Xak, Nasname, Çand, Ziman, Yekîtî, û bi giştî hebûn û mana Kurdan lêdide, ev xemxar û parêzerên berjewendiya netewî ne,
Berjewendiya netewî ya Kurdan ku bi dirêjahiya dîrokê ji aliyê dujmin û dagîrkarên Kurdistanê ve kevtiye ber metirsiyê, her kes dizane ku Kurdan bi şer û berxwe dana xwe heya niha jî nehêlane ku dujmin di armancên xwe de serkeve, lê di vê navberê de mixabin karîne bi par par kirin û xistina netifaqiyê di nava gelê me de, zêdetir berjewendiya netewî ya Kurdan bixine ber metirsiyê.

Dema ku stratîjiya netewî û xebata ji bona gihîştin bi mafê netewî xuyaye ku çiye, dema ku xemxarên berjewendiya netewî yaku destê wan tê qisoriyê nakin ku bikarin siyaseta asîmîlasyona dujminan pûç û betal bikin, dema ku xortên xwedî hest ji bona bidestxistina mafê netwewî şer dikin û li hember dujmin de canê xwe danane ser destê xwe, dema ku part û aliyên siyasî û girûp û saziyên xebatkar ên Kurd heçî kar û siyaset û pitansiyela xwe terxan dikin bo berjewendiya netewî û ji bona gihandina dengê mafxwaziya netewa xwe û dujminkariya dagîrkeran hewcehî bi yekîtî û yek dengiyê hene daku bikarin wek parêzerên berjewendiya netewa xwe bibin cihê hêviya gelê xwe û bi yekîtiya xwe, hêza xwe nîşanî hemî cîhanê bidin û bikarin bala wan bo aliyê xwe rakêşin, rast di demeke wiha de, dujmin jî kariye hinek kes an girûpên Kurd bi dijî berjewendiya Kurdan bixwe bikar bîne.

Her ewa ku dujmin kariye ji riya wan Kurdan ve yekîtiya di nava mala Kurdan têk bide, ewa kariye berjewendiya netewî ya Kurdan bixe ber metirsiyê.

Berjewendiya netewî ya Kurdan ku bê dewlet û bê welatê serbixwen e, tenê bi yekîtî û yekdengîya xebatkar û part û aliyên siyasî tê parastin.
Lewra, bila her kes baş bizanibe ku dema her hizb û aliyeke siyasî, an her kesek bi kiryarên xwe derbê ji yekîtî û yekdengiya Kurdan li pêxema stratîjiya netewî bide, bê guman ev kes û alî ger Kurd be û xwe xemxarê doza Kurd bizane jî, li ber vê ku kiryarek an qiseyek kiriye ku bi dilê dujmin bûye, ev dijî berjewendiya netewî ye.

# Dr. Mihemed Zeyno: “Derd û kul û xema Tirkan tenê pirsa Kurda ye. Bi her şêweyî li dijî mafê gelê Kurd e”



Dr. Mihemed Zeyno

**Me digel Dr. Mihemed Zeyno li derheq lihevkirina Çîn, Rûsiya, Sûriya. Îran û Tirkiyê hevpeyvîn pêk anî navbirî got: “Qada Sûrîyê bû meydana cirîtiya berjewendiyên di navbera WYA û Ewropa û welatê Rûsyayê. Şêrê li ser erdnîgariya Sûrîyê kon û kevine.”**

**P: Gelo bandorên nerînî û erênî ya civînên Rûsya, Tirkiye, Îran û Sûriya li ser tevgera Kurdan çi dibe?**

**B:** Ev bû çend salin ev her çar welat di liv û tevgerê de ne.
Hin caran li paytexta Rûsya, Moskovayê û li Aştana û Soçî dicivin.
Bandora herî zêde para Rûsyayê li ser kirîza Sûrîyê heye.
Têkiliyên herdu welatan kûr û dirêjin, ew vedigerin salên pêncî sedsala borî.
Diyare dewleta Sûryayê bi temamî paldaye.
Hemû çek û alavên leşkerî ji Rûsyaya tên, hemû projeyên aborî para fîrmên Rûsî ne, paşeroja Sûrîyê di destê Rûsyayê de ye.
Îro li Rojhilata Navîn tenê Sûrîyê di bin kontrola Rûsyayê de maye, ji ber hindê Hemû giraniya xwe da ye da ku ew welatê girîng ji destê Kirêmlê bê fire.

Her weha Îran jî bi sala ye hewil dide bikeve xeta piştevanîya rejîm Sûrîyê û ta radeyekê bi serket.
Welatê Tirkiyé nû ye di kirîza Sûrîyê de.
Derd û kul û xema Tirkan tenê pirsa Kurda ye.
Bi her şêweyî li dijî mafê gelê Kurd e.
Demek xetera herî zêde bo Kurdan rejîma Tirkiyê ye.
Di vir de lihevkirina van her çar welatan bo Kurdan metirsiye.
Gelek nakokî û dijberî di nav wan de hene
Gelek kêşe û alozî di nav wan de hene
Lê bi gelemperî li ser qedera Kurdan yek helwestin, helwestên neyênî ne.
Erênî ya van hevdîtinan, heger bi serkevin ewe, ku aramî serdest be.
Gelê Surî westiya ji malwêranî û jar û belengaziyê.
Êdî dibê dengê çekan nemîne.

**P: Gelo dibe ev civîna wan welatên Rojhilata Navîn bersevek be li hember Amerîkayê û Rojavayê be û bandorê vê çi dibe?**

**B:** Belê, qada Sûrîyê bû meydana cirîtiya berjewendiyên di navbera WYA û Ewropa û welatê Rûsyayê.
Şêrê li ser erdnîgariya Sûrîyê kon û kevine.
Aştî li herêmê bi tevahî sernakeve bêyî Sûrîyê.
Sûrîyê bû hêka terasoyê, kîjan welata Sûrîyê bi alî xwe ve bîn e, ew welat dibe xwedî bandor li Rojhilata Navîn.

**P: Gelo dibe ev civîna Rûsya, Tirkiye, Îran û Sûriyê, Çînê jî rol hebe?**

**B:** Welatê Çînê ne dûrî herêma me ye.
Berjewendiyên Çînê hinohino zêde dibin
Çîn giraniyeke wê aborî û siyasî peyda dibe.
Mîna her welatekê bi bandor, Çîn jî hewildanên mezin dike ku para wê di proseya siyasî ya Sûrîyê de hebe.
Bi texmîna min di demeke nêzîk de Çîn jî tevlî hevdîtinan dibe.

**P: Gelo di vê heyamê de em dibînin ku hem Erebistan û Îran û hem jî Tirkiye, Sûriye, Îran û Mosko dicivin û lihevkirinan pêk tînin, ev lihevkirinan li ser tevgera Kurdên her çar parşan bandor heye?**

**B:** Dîrok û mêjo ya ne dûr a gelê Kurd xuya dike ku her hevhatinek van welatan çi bi hev re be û çi du alî bin, xêr bo me nîne.

Di nava welatê wan de kêşa Kurdî heye.
Li wan welatan kêşe çareser bûye.

Berovajî wê her ku diçe kêşa Kurd bin pêl dibe, zor û zehmetî pirrtir dibin, mafê gelê Kurd tune dibe, erdnîgariya Kurdistanê kambax dibe, gelê Kurd koç dibe, Kurdistan çol dibe.
Ez çi hêviyê di guhartineke radîkal di sîyaseta Tirkîyê û Îranê û Sûrîyê de nabînim, na di rejîmên van welatan û ne jî rikeberîya wan de .
Li rojavayê Kurdistanê ev diyarde baş diyare û eşkereye, belê di hin mecalan de helwesta peyeyên rikeberîyê kambaxtire ji ya peyayên rejîma Sûrîyê.
Her çi ev welat lewaz bibin, ewqas başe bo me Kurdan.
Dijîtiya wan ne li hember yek partî an komek an aliyekî Kurdiye. Tevahiya gelê Kurd armanca wa ye.

Heger hin demokrat û dostên Kurdan di nav wan de hebin, û hene jî, lê dengê wan çelmisiye û bê hêz û bê bandor in.
Ji van hersê welatan, metirsiya herî zêde ji alî Tirkiyê ve tê.
Ew serkêşîya govenda dijberiya Kurdan dike.

**P: Gelo dibe ev civînên eşkere yên her du aliyan bersivek be bo Amerîka û welatên Rojavayî be? Ger wisa ye çawaye?**

**B:** Îran welatekî mezin û bihêz e, mîna her welatekî, cew jî li meydana cirîtiya xwe digere.
Çi caran dijberî di nava welatan de na dumin.
Piştî her ceng û şerekî, proseya aştiyê destpê dike.
Diyare dema bidawî anîna aloziyan di navbera Îran û derûdoran destpê kiriye.
Vaye bi Erebîstana Siûdî re diçe serî.
Diyare ev prose li vir tenê namîn e.
Bi aramkirina têkiliyên bi welatên cîran re, Îran hewla çewsandina tevgera azadîxwez ya gelê Îranê bi gişt û gelê Kurd bi taybetî, dike.
Piştî şehadeta Jîna Emînî û serhildana “ Jin, Jiyan, Azadî” rejîma Îranê rezîl û riswa bû, rûyê wê qirêj û reş, kevneperest û tund li seranserî dunyayê eşkere bû .
Ji bilî aramkirina têkiliyên bi derûdora xwe re çi dergeh neman.

Bo min diyare bin pêkirina mafê gel û mirovan ne ewqas girîng e sebaret Erebîstana Siûdî an Tirkiyê an Rûsyayê an jî Emerîka .
Ji ber hindê wê piştevanîya tevgera azadîxwaz ya gelê Îranê bi demê re kêm bibe.

Nûce û hewalên serhildana gelê Îran hinihino kêm dibin di ragihandin û alavên rojnamegeriya ereban û Ewropayê rojane, em nema demokratên Îranê dibînin wek mêvan li ser ekranê kenalên ragihand û rojnaman, demek em dibînin ku helwesta nêzîkbûna rejîma Îranê bandora neyênî ye bo gelê Îranê bi giştî.

**P:Gelo ev civînên Îran û Erebistan, û Îran, Sûriye, Tirkiye û Moskoyê bandorên erênî û nerînî li ser Kurdên her çar parşan hene?**

**B:**Bi nerîna min, di demek nêzîk de çi guhartineke cografî di neqşa herêma me de çê na bin.
Referandûma Herêma Kurdistanê hewla dawî bû bo guhartineke girîng di neqşa sînoran de.
Her çendî em pêşbîn bin.
Her çendî em daxweza dewleta Kurdistanê bikin.
Lê diyare di vê demê de welatekî nû bi navê KURDISTAN, welatekî serbixwe dernakev e meydanê.
Ew proseya salên paşerojê ye.

# Di 14ê Gulana 2023yê de, dê hilbijartinên parlamento û serokkomarîya Dewleta Tirkîyeyê bê li darxistin



N: Mustafa Oziçelik

Di 14ê Gulana 2023yê de, dê hilbijartinên parlamento û serokkomarîya Dewleta Tirkîyeyê bê li darxistin

Di 14ê Gulana 2023yê de, li Tirkîye û li Bakurê Kurdistanê, dê hilbijartinên parlamento û serokkomarîya Dewleta Tirkîyeyê bê li darxistin.

Ji bo vê hilbijartinê PAKê(-Partîya Azadîya Kurdistanê) û TDK-TEVGERê(Tevgera Demokratîk a Kurdistanê) roja 13.04.2023yê deklarasyonek ji raya giştî ra aşkere kirin.
Ez dixwazim beşeke vê deklarasyonê bi xwendeavanan ra parve bikim:

''Hilbijartinên 14ê Gulanê, di demeke ku hîna birînên erdheja 6ê sibata 2023yê nehatine kewandin, têne li dar xistin.

Dewleta Tirkîyeyê di vê erdhejê de, bi hemû dem û dezgehên xwe ve, di binê kavilên erdhejê de maye. Encamên erdheja 6ê sibatê, di eslê xwe de berhem û nîşana hişmendî û sîstema pûç ya Dewleta Tirkîyeyê ye; qetlîameke ku failê wê desthilatdarîya Hikûmeta AK Partîyê û hemû dezgehên Dewleta Tirkîyeyê ye. Lê belê, Serokkomarê Tirkîyeyê, desthilatdarîya Hikûmeta AK Partîyê û dezgehên bingehîn ên Dewleta Tirkîyeyê weke ku tu tiştek nebûbe, weke ku tu berpirsyarîya wan di vê qetlîama erdhejê da tunebe, tevdigerin.

Du sebebên esasî hene ku ev desthilatdarîya dewleta Tirkîyeyê bi vî rengî bê tirs û bê xem tevbigere. Sebeba yekem ewe ku li Tirkîyeyê di nava gelê Tirk de hêzeke xurt, girseyî û bi rêxistinî tuneye ku bikaribe li mafên xwe xwedî derkeve; daxwaza azadî, demokrasî, edalet, wekhevî û jîyaneke mirovane bike. Sebeba duyem jî hejarîya rêxistinî ya li ser xetek neteweyî, demokratîk û kurdistanî û bêtifaqîya kurdan e. Mixabin li Bakurê Kurdistanê, teva hemû bedelên giran yên hatine dayin jî tevgera rizgarîxwazîya neteweyî û demokratîk ji yekgirtinek siyasî û rêxistinî û hevkarîyek neteweyî û kurdistanî bêpare; heta li ser daxwazên acîl yên miletê Kurd û kurdistanîyan dahî ne xwedîyê hevkarî, yekitî û bereyek berfirehe.

Ev herdu sebebên bingehîn, li gel konjonktura sîyasî, aborî ya Rojhilata Navîn û cîhanê, keys û derfetê dide rayedarên Dewleta Tirkîyeyê ku di warê vê karesata mezin ya erdhejê, qeyrana aborî, mafên mirovî, azadî, demokrasî û edaletê de û herweha di warê mafên miletê Kurd yên neteweyî, demokratîk û kulturî de ewqas bê xem be; xwe nede ber tu guherandin û çareserîya van pirs û pirsgirêkan.

Ev bêrêxistinbûn û li mafên xwe xwedînederketina gelê Tirk û bêtifaqîya kurdan, weha dike ku partîyên mixalefetê yên Dewleta Tirkyeyê jî bi awakî bêminetî tevbigerin. Ew jî behsa mafên miletê Kurd yên neteweyî, demokratîk, kulturî û heta mafên perwerdeya bi zimanê kurdî nakin.

Bi kurtayî îro li Tirkîyeyê, hem desthilatdarîya AKPyê û hem jî muxalefeta heye, ji bernameyek ku mafên bingehîn yên gelên Tirkîyeyê û nemaze mafên miletê Kurd û pêkhateyan li gor pîvanên hiqûqa gerdûnî û mafên mirov diparêze, bêpar in.

Tifaqa Cimhûr jî, Tifaqa Milet jî hebûna miletê Kurd û mafê miletê Kurd yên ji miletbûnê tê, nexistine bernameyên xwe!

Rewşa desthilatdarîya hukûmet û muxalefetê diyar dike ku piştî 14ê Gulanê jî, ji bo miletê Kurd û pêkhateyan, tu guherînên bingehîn pêk neyên. Hukûmet, serokkomarî û muxalefeta heye, hebûn û berdewamîya dewleta Tirk ya li ser bingehê dagirkerî, nîjadperestî, înkar û asîmîlasyona miletê Kurd û pêkhateyan hatiye ava kirin, diparêzin.

Ew li ser paradîgmaya “yek dewlet, yek milet, yek welat, yek al û yek zimanî“ û parastina vê struktur û sîstema dewleta Tirk misoger in. Ew ji guherînên bingehîn re ne amade ne.

Desthilatdarî, hukûmet û muxalefet jî, di warê neguherandina her çar xalên Qanûna Bingehîn yên neguherbar de, ku hebûna miletê Kurd, zimanê kurdî, hemû mafên neteweyî, demokratîk û kolektîf yên miletê Kurd û kurdistanîyan qedexe dikin, xwedî eynî raman û helwestê ne.

Tifaqa Milet jî û Tifaqa Cimhûr jî di deklerasyonên xwe yên hilbijartinan de, mafê miletê Kurd yên herî xwezayî yên weke nasnameya kurdî, perwerdeya bi zimanê dayikê û mafê bi nasnameya xwe rêxistinîyê, behs nekirine û neanîne zimên. Teva ku Tifaqa Milet dibêje ''emê pirsa Kurd li parlamentoyê çareser bikin'' jîbeyî çend gotinên glover, ji bo pênasekirin û çareserkirina pirsa miletê Kurd û Kurdistanê, heta niha tu bername pêşkêş nekirine. Bêgûman, hinek gavên ku Tifaqa Milet dixwaze bavêje, hata radeyekê belkî bikaribe vê zexta li ser civatê heye, hinekî kêm bike. Lê, bernameya wan ya di derbarê azadî û demokrasîya li Tirkîyeyê jî, bi gelek qeyd û şerdan ve hatîye girêdan û ev jî rê li ber pîvanên gerdûnî yên azadî û demokrasîyê digre.

Bi van bername û helwestên xwe diyar dibe ku herdu tifaq jî di mijara çareserkirina pirsa miletê Kurd û Kurdistanê de ne xwedîyê cudahîyên bingehînin.

Herdû îtifaq jî li ser parastin û berdewamîya siyaseta degirkerî û statukoparistina dewletê, hemfikir in.

Tifaqa Ked û Azadîyê û Partîya Çep ya Kesk jî di deklerasyonên xwe de dibêjin ku ''emê pirsa Kurd bi rêyên demokratîk çareser bikin''. Lê mixabin wan jî di deklarasyon û bernameya xwe ya hilbijartinê de, di derbarê pênasekirin û çareserîya pirsa miletê Kurd û Kurdistanê de û ji bo daxwazên acîl yên kurdan, ji xeynî çend gotinên glover, tu tiştekî berbiçav dest nîşan nekirine; ew di vî warî re rewşê şolî dikin û siyasetek li ser esasê tirkîyeyîtî didin pêş.
Em ê bi tu partîyan re tifaqa hilbijartinê nekin, lê em ê dengên xwe bidin HAK-PARê

Em wek TDK-TEVGER û PAK biawakî fermî nikarin beşdarî hilbijartinan bibin û di vê wexta teng da alternatîfa namzedên serbixwe jî ne di rojevê de ye.

Emê bi tu partîyan ra jî nekevin nav tu hevkarî yan jî tifaqên hilbijartinan.

Di nav partîyên ku beşdarî hilbijartinan dibin, wek ber-

Dom R:6

**Doma R:5**

name û daxwazên ku di deklarasyona xwe ya hilbijartinê da nîşan dane, em HAK-PARê nêzî xwe dibînin.

Cîhê mixabinîyê ye ku, HAK-PARê di van 8 salên dawîn de, ji xeynî çend îstîsneyan, xwe ji hevkarî û xebatên hevbeş yên bi partîyên kurdistanî re dûr xistîye. Pêşniyarîya PAK û TDK-TEVGERê ya ku "em pêşî hevkarîyek neteweyî, demokratîk û kurdistanî ava bikin; helwest û hevkarîya hilbijartinê jî weke beşekî xebata vê hevkarîya millî û demokratîk binirxînin", HAK-PARê bê bersîv hiştîye. Di encamnameya civîna Meclîsa Partîyê ya HAK-PARê ya 1ê nîsana 2023yê de, qet behsa vê mijara ku bi partîyên Kurdistanî re avakirina îtifaqa hilbijartinê nehatîye kirin.

Ji ber van sedemên esasî yên ku em li jorê diyar dikin, em dê bi HAK-PARê re jî tifaqek hilbijartinê pêk neînin. Lê belê Rêzdar Duzgun Kaplan Serokê Giştî yê HAK-PARê di 4ê nîsana 2023yê de ji PAKê û TDK-TEVGERê ra nameyek şand. Di vê nameyê de,rêzdar Duzgun Kaplan diyar dike ku "hema piştî hilbijartinan ji bo avakirina hevkarîyeke milî û demokratîk HAK PAR ji bo hevdîtinan amadeye û di vî warî de çi bikeve ser milên wan wê bi cih bînin". Em weke PAK û TDK-TEVGERê vê nameyê weke helwest û hewldanek erênî dinirxînin; herweha ji bo ku HAK-PAR partîyek kurdî ye û ji bo ku em program û daxwazên wê yên siyasî di nav xeta neteweyî û kurdistanî dibînin; em dê di hilbijartina parlamentoyê ya 14ê gulana 2023yê de dengên xwe bidin HAK-PARê. Em hêvîdar in ku ew beyan û helwesta Rêzdar Duzgun Kaplan ya li jor û vê piştgirîya me ya ji bo HAK-PARê, dê piştî hilbijartinan bibe zemîn û destpêka hevkarîyeke milî û demokratîk ya li Bakurê Kurdistanê.

Di hilbijartinên serokkomarîyê de jî em dê li gorî menfeet û daxwazên meşrû yên acîl ên miletê Kurd helwestê bigrin û tevbigerin. Kîjan namzed li pêşberî raya giştî bi awayekî zelal û şefaf teahudê bide ku ew dê daxwazên acîl yên miletê Kurd di Qanûna Bingehîn û di qanûnên din ên peywendîdar yên Dewleta Tirkîyeyê de bicîh bike, em dê piştgirîya wî bikin.

Tecrubeyên heta îro nîşan dane ku heta Kurd nebin xwedîyê tifaqek neteweyî, weke alîyekî tevnegerin û bi hevbeşî li daxwazên xwe yên neteweyî û demokratîk xwedî dernekevin, bi yek helwestê hêza xwe nîşan nedin, em dê nikaribin tu mafên xwe yên neteweyî, demokratîk û kulturî bidest bixin û destkeftinên xwe biparêzin, Em dê nikaribin tesîrê li ser helwesta van tifaqan û partîyan bikin. Em dê nikaribin tesîrê li ser guhertinên Qanûna Bingehîn bikin û em dê nikaribin sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya dagirker û asîmîlasyonî ya di derbarê miletê Kurdû kurdistanîyan de, biguherînin.

Loma jî li Bakurê Kurdistanê divê ji alîyekî ve ji bo avakirina hevkarî, tifaqek, bereyeke mayende, stratejîk û kurdistanî xebat bê meşandin; ji alîyekî ve jî divê em hewl bidin ku li ser daxwazên acîl yên miletê Kurd, hêza hemû pêkhateyên Kurdistanê û gelê me yê li bajarên metropolên Tirkîyeyê dijîn bikin yek. Ji bo rê li ber çareserîya pirsa Kurd û Kurdistanê vebe, ji bo ji îro ve em wek gelên Kurdistanê û kurdên li bajarên metropolên Tirkîyeyê dijîn, mafên xwe yên acîl bidest bixin, divê em weke terefekî tevbigerin.

Yekitî, hevkarî û hevrêzîya partî, rêxistin, tevgerên kurd û kurdistanîyan navnîşana çareserîya pirsa miletê Kurd û Kurdistanê ye!"
14.04.2023

**Mustafa Ozçelîk**
**Serokê Giştî yê PAKê**

## Guterres daxwaza bidawîanîna aloziyên Sûdanê dike



Neteweyên Yekgirtî daxwaza bidawîanîna şerê navxwe yê li Sûdanê û destpêkirina gotûbêjên navbera aliyên wî welatî dike.

Neteweyên Yekgirtî daxwaza bidawîanîna şerê navxwe yê li Sûdanê û destpêkirina gotûbêjên navbera aliyên wî welatî dike.

Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî Antonio Guterres hişyarî li herdu aliyên şer ên li Sûdanê da û ragihand, divê demildest dawî li pevçûnan were anîn.

Antonio Guterres eşkere kir, divê rewşa Sûdanê aram bibe û gotûbêj dest pê bike, da ku dawî li qeyranê were anîn.

Guterres diyar kir, zêdebûna tevlihevî û aloziyên navbera Artêşa Sûdanê û Hêzên Bersivdana Bilez, bandoreke wêranker li ser welat û navçeyê dike.

Sûdan careke din nêzîkî kudetayeke din dibe, du aliyên serbazî yên desthilat, rûbirûyî hev bûne û bi dehan kes di şer û pevçûnan de hatine kuştin.

## Remezanê Kurdên Kazaxistanê gîhandine hev

Li Kurdên ku bajarê Almatayê paytexta berê ya Kazaxistanê dijîn di meha Remezanê bi serpereştiya Komeleya Berbangê li hev kom bûn û bi hev re fitar kirin.

Kurdên şêniyên Almatayê ji bo fitarê li hev kom bûn. Rêveberiya Yekîtiya Komeleyên Kurdên Kazaxistanê "Berbang", weke her sal vê êvara meha Remezanê şîva bi komel organîze kiriye.

Serokê Yekîtiya Komeleyên Kurdên Kazaxistanê Ezîzê Ziyo Bedirxan got "Nêzikî 10-15 hezar Kurdên me li Almatayê dijîn, gişt yek in îro civiyane ji bo xwarinê, bo dînê me xurt bibe, ji Xwedê bawer bikin. Ji bo wî tiştî ye ku yekîtî çêbibê, ji hev fem bikin, em zimanê xwe ji bîr ne nekin, dînê xwe ji bîr nekin, welatê xwe ji bîr nekin, edetên xwe ji bîr nekin."

Kurdên Kazaxistanê hemû misliman in. Ta beriya çend salan tenê kesên temenmezin wecîbeyên dînî pêk dianîn, lê wan salên dawî, ciwan jî vedigerin ser nêrîtên îslamê.
Parlamenterê berê yê Parlamanetoya Kazaxistanê Vekîl Nebiyev dibêje "Di rojiya Remezanê de divê em



hev bibexşînin, alîkariyê bidine hev, destên xwe dirêjî malbatên dest teng bikin. Ew însanên me yên ku nexweş di giraniyê de ne bila xwedê sivikatiyê bide wan."
Kurd salên 1937 û 1944a û paşê jî salên 1990î ji Gurcistan, Azerbaycan û Ermenistanê hatine sirgunkirin li Kazaxistanê.
Karsaz Fexredîn Elî Şemoyî "Bavê min Elî Evdirehman li Gundê Bayraqê yê Wanê ji diya xwe bûye û welatê me ew der e. Ez li Ermenistanê ji diya xwe bûm paşê em hatin derbazî Azerbaycanê bûn. Meha Remezanê me jî digihîne hev."
Wek nêrît, diyasporaya Kurd di Cejna Newrozê de bi girseyî dihatin ba hev. Lê ev çend sal in, di meha Remezanê de jî kombûnên weha, bi boneyê vekirina Fitarê jî êdî bêye nêrîteke mayînde.

# Dîmenên jênosayda dijî jinan li Îrana Islamî de



## N: Mecîd Hekî

Li despêka damezrandina Komara Îslamiya Îranê, jin wek armancek bo sepandina aydîolojiya faşîzmê li deselata rejîma Îranê de hatiye berçav kirin. Bi gor distûra Komara Îslamiya Îranê erka sereke ya jinan zarok bûn û perwerdeya nifşek "mektebî" û xwedî bawer bi nirx û buhayên Îslamêye.

Destûra Komara Îslamiya Îranê tu rolekê ji bo jinan li civakê de wek nîwiya civakê qebûl nake û beşdariya jinan li jiyana siyasî, civakî û abûrî de dijî buhayên Îslamiya xwe dizane. Lewma jî ser barê wê ku di 20 salên derbazbûy de zêdeyî 50% li xwandekarên zanîngehan keç in, tenê 14 % li jinan li bazara kar de kar dikin.

Nêwiya civakê yanî jin bi dirêjiya temenê Komara Îslamî de bi awayên cur bi cur ketiye ber zulm û zoriyê. Yasayên Komara Îslamî jinan li her warekê de wek şarovendên pile du (2) hejmar dike û tu mafeke mirovî ji bo jinan ku wek şaromendek îroyî bê berçaw kirin nas nake.

Ger hewcehiya pêwendiyên Komara Îslamî bi civata nawnetewî nebûya û asta hişyariya neteweyên Îranê bi awayek giştî ji bin buwaye, belkî rejîma Îranê wek deselata Taliban rêya çûna nav civaka jinan bi temamî girtiye. Felsefeya Komara Îslamî li ser bingeha cudahî û apartaydê hatiye damezrandin. Apartayda zayendî (cênder), apartayda netewî dijî neteweyên ne fars û apartayda ayînî dijî ayîn û olên din ku şîyeya 12 îmamî nebin.

Komara Îslamiya Îranê li roja damezrandina wê û nasyonalîzma navend geraye Îranê bi dirêjiya dîroka xwe tundûtîjiya pêşgîrane dijî neteweyên din bixasmayî Kurdan bikar biriye. Tundûtîjiya pêşgîrane (preemptive violence) wek beşek li nasnameya nasyonalîzm û sîstema hikûmeta Îranê bi awayek sîstematîk hemû nasname û bûnên din ku derevey bazneya pênaseya dewleta navendî û nasyonalîzma farsîzmê de qedexe kirine.

Wek qedexe kirina perwerdeya zimanê Kurdî bo xelkê Kurd li Rojhelata Kurdistanê Kurdên rûniştiyên beşên din ên Îranê, guhartina nav û nasnameya erdîngariya neteweyên bin dest wek guhartina navê bajar, gund û çiya û deştên Kurdistanê.

Tundûtîjiya pêşgîrane bûye beşek li siyaset û sîstema deselatdariya Komara Îslamiya Îranê. Qedexe kirina azadiya bergên jinan û mecbûrî kirina "hîcabê" û qdexe kirina gelek li çalakî û hilbijardinên din ên jinan. Ewane hemû ji bo wêye ku pêşiya pêşweçûna jinan û wekheviya civakî bê girtin. Ji ber ku bingeha rejîma Îranê li ser cudahî danan û apartayd û mêrsalariyê hatiye damezrandin.

Piştî kuştina welatiya Jîna Amînî li Eylûla 2723 de serhildan û despêka şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" hemû nîşan û hêmayên zulm û stema Komara Îslamî, dijî jinan, neteweyên bin dest û bingeha dewleta Komara Îslamî û nasyonalîzma ser dest kete lerzê. Şoreşa Jîna bi silogana "Jin, Jiyan, Azadî" bo cara yekem hemû astên civaka nav coxrafiya Îranê bi awayeke yek girtî rûxana rejîma Îranê kirine armanc û alîngariyeke cidî li hember Komara Îslamî û deselatdariya navendgera pêk anî. Silogana Jin, jiyan, Azadî, ku li Kurdistanê dest pê bû bi zûyî hemû Îran girt û bû siloganek cîhanî û piştgiriyek bê wêne ji bo xebata xelkên Îranê li asta navnetewî bi dest anî.

Rêberê Komara Îslamîya Îranê, Xameneyî li axivtinek xwe de basa wê yekê kir ku ew kesên ku beşdarê "aloziyan" bûne diviya bên tenbî kirin. Berî wan gotinan rejîma Îranê êrîşên terorîstî kirine ser Başûra Kurdistanê bo ser bingehên hêzên Rojhilata Kurdistanê.

Rejîma Iranê bi behre wergirtin li ezmûnên Rûsyayê li Çêçênistanê û Sûriyê li qetlamkirina xelkê sivîl û bêtawan karî şoreşa serxwebûna Çêçênistanê bişkîne û Şoreşa xelkên Sûriyê bi cinayetên xwe bike tirajîdiyek mezin a mirovî. Bi wê ezmûnê û bi behre wergrtin li teknolojiyên nû serkutkirinê pêvajoya jehrandina dibistanên kiçan dest pê kir.

Sîstema sîxoriya rejîma Îranê li ser dijberên navxwe û nasîna wana sermaye guzariyek mezin kiriye, lewma gelek caran bi zûyî an li rêya "îqrarên" bi zorî serekaniya "aloziyan" peyda dike. Lê, li ser pirsa kîmyayî kirina dibistanan heya wê gavê jî zanyariyên hewce nehatine weşandin. Ne tenê ewa rejîma Iranê ye ku hemû hewla xwe daye pêşiya weşana nûçeyên pêwendîdar bi jehrandina xwendekaran bigirin.

Li çend mehên derbazbûy de bi dehan dibistanên keçan li seranserê Îranê ketin ber êrîşa jehrandina sîstematîk û rejîma Îranê ji bo weşartina wê cînayetê hemû hewlên xwe dide.

Li rastiyê de jehrîkirina dibistanên keçan dirêjahiya tundûtîjiya pêşgîraneye hem ji bo bi cîh gihandina fermana Xamineyî ji bo "tenbî kirina" wana û tolhildan li keçan bo daku dîrokê wegerîne bo ser dema berî despêka şoreşa Jin, Jiyan, Azadî.

## Nerîna Lîderan



**"Mihemed Nezîf Qadrî:"**
"Hewldana me ew e ku li Îranê komareke federal a laîk a demokratîk ava bikin.



**"Seidî Pîra":**

Li Kerkûkê metirsî li ser kurdan heye.



**"Ellie Cohen:"**

Vejandina peywendiyên Siûdî û Îranê dikare bi kêrî Îsraîlê were.



**"Elî Xamineyî":**

Pirsên curbicur ên welat nikarin bibin mijara referandumê.

# Êrîşên kîmyay yên li ser xwendekarên keç

**N: Nîştiman Urmiye**
**W: Hesen Mukerem**

Ger ji civakê daxwaz bê kirin, ku dev ji tevgerê berde, ji cîhanê pare bimîne û di rêya pêşkevtina biyaniyan de bimeşe, dibe ku jinên vê civakê di wan her sê kategoriyan de tûşî mirina biyolojîkî bin, heta ku zihniyetên cemdî ên serdema mirovên Palîtîk desthilata mutleq xwe bikare bihejîne.

Ev yeka mijara jinên civaka me ye, eşkere û veşartî di wan her sê pêkhateyan de rastî êrîşan dibin hata ku vebijêrka bilî qebûlkirina daxwaziyên ne rewa yên dijî jinê tune bin, êrîşên kîmyayî yên li ser dibistanên keçan mînaka herî nêz a li dijî jinê ye.

Herçend ku destên veşartî yên di jehrîkirinên berê yên dibistanên keçan de bi awayê fermî ji bo hizra giştî nehatiye pejrandin, lê em nikarin wê terora hatî rêkxistinkirin bi komên piçûk ên li derveyî welat ve girê bidin;

Komara Îslamî di heyama dîroka desthildariya xwe de, stûnên desthilatdariya xwe li ser serkutkirina jinan binyat kiriye, bi berûkek(mask)ê hin siyaset rêkixistin kirin ku hilgirê jinavbirina hêdî hêdî ya jinê di civakê de be, ji siyasetên dehkên 60`î kêmbûna nifûsê heta siyasetên dehkên 80`î zêdebûna nifûs û zewaca zarokan bigire heta pîlana nûjenkirina nifûsê di heyama du salên borî de, hemû xwediyê peyameke tev zelal in, jin dibe li Navenda Civakê bê bêparkirin û bi Navenda Malbata Zilamsariyê re ku bilî erka pêragihîştin bi daxwaziyên hevjîn û tiromibîla pêşkevtî ya zarok çêkirinê li ti cihek din de zelal nekiriye, daku bê zivirandin.

Lewma, di heyama 40 sal temenê desthildariyê de ti yek ji taktîkên cerbandinê bersivdarê daxwsaziyên li dijî jinê yên Komara Îslamî zêde ber bi pêşve neçûne û jinên Îranê hertim nîşan dane ku pêngavek pêş ji siyasetên xirab ên li dijî jinê yên Komara Îslamî de bûne û digel hebûna tevahiya sînûran di piraniya mijarên mezin yên civak û siyaseta Îranê de pêşeng bûne.

Mecbûrim bûyerên berê ku pêsîra dibistanên keçan li se-





ransere Îranê giritiye, bi tevahiya temenê desthilatdariya Komara Îslamî re pêwendî bidim jiber ku seriyeke vê mijarê girêdayî navika wan hizrên veguhastî yên dijî jinê girêdayî bi hikûmetê ne, wiha em nikarin vê îhtmalê red bikin ku pişta biyoterorîsmê girêdayî bi reha Komara Îslamî ye û di cografiya pan a Îranê de li hereketê de ye.

Vê carê jin bi berrû(mask)ê, lê di esas de zihniyeta Talibanîsimê kirine armanc û dikarin vê yekê weke tolhidana dijwar li jinan bi hincenta Şoreşa Jînayê(Jin, jiyan, Azadî) şirove bikin.

Lewma, divê bo îzolekirina sîstematîk a jinê rêçareyekê peyda bikin û xala herî baş û hişmendîtir li destpêk û li bingeh an gotinek din fetisandin di spêrmê de nine; Ev êrîşên kîmyayî armancên xwe di du aliyên derûnî û fîzîkî de bi kûrahî bicih dihêle, û bi gotinek din vê tişta girîng dixwaze ku hêdî hêdî guherîna rêveberiyê ji bo dev berdana jinan ji xwendevaniyê ye, ev jî di bingehê de, tam di heman devra temen de ku her tişt ji bo zewanca zarokan ku mezintirîn daxwaza vê sîsteme ye cî bi cî dibe û heta qasekê di vê heyamê de li ser aliyê derûnî kar hatiye kirin.

**Bi giştî biyterorîsma berê û armanckirina dibistanên keçan xwediyê çend armanca ye:**

1- Rawestandina hereketa şoreşa borî û danîna wê di dilê pîvanên girîng ên tepeserkirinê de;

2- xêza paşverû ya olî di berdewamiya hemû kar û baran de;

3- Ji bo qulibandina hêmanên nûgihîştî bi qasî ku pêkan be vekirina toreyên navxweyî yên çewisandinê;

4- Berbelavbûna aliyê derûnî yên êrîşên plankirî heta radeyekê ji bo tasfiyekirina fizîkî ya jinên ciwan di qonaxa herî hestiyar a jiyana xwe de;

- 5Asayîkirina şîdeta nerm û veşartî ya li dijî jinan û gurkirina encamên vê şîdeta ku dibe sedema tecrîdê;

6- Siyasîkirin û girêdana wê bi opozisyona li derveyî desthilatdariyê û welatên derve re, ku bi armanca givaşan li ser kes û alîgirên komeke diyarkirî tê kirin;

7- Lawazkirina motîvasyona xebatê di jinan de, ji ber wê jî ew ewlekarî û hesta selametiyê li hember xwe winda dibîne.

# Ev bihuşta ku di bin pê daykan de nine..



N: Vênûs Fayq
W: Hesen Mukerem

Di qura`anê li derheq dêv û bavan de ayek zelal heye ku ku sureya 23`ê dibêje: “ وَقَضَى رَبُّكَ أَلاَّ تَعْبُدُوا إِلاَّ إِيَّاهُ وَبِالْوَالِدَيْنِ إِحْسَانًا”, pêka ya ku di yayetê de û li Qura`ana pîroz de hatiye mirov dikare bêje cihê baweriyê ye..

Lê ger tenê heyama demê ya di navbera vebêjêrên hedîsên Pêxember d ku dem bi dem gotinên pêxemberan bas kirine, ev yeka bese bo vê ku gumaneke pir zêde li derheq hedîs û serpêhatiyan de hebe ku mela û feqîh bala xwe didinê, ji ber vê yekê eger em zêde nebêjin ku tev hedîsên pêxember cihê gumanê ne, yek ji wan dibêje ku: Bihuşt di bin pê dayîkan de ye.

Ger ji aliyê demê ve, ( Bihuşt di bin pê dayîkan de ye) şirove bikin, digihîjin bi vê heqîqetê ku, tiştek bi navê bihuştê di bin pê dayîkan de tune ye, çimkû her tişta ku însan pê li ser dabinê bê nirx û vala ye, ev bihuşta jî ku Qura`an bas ji vê dike tişteke vala nine.. Ger mebest ji vê bihuştê jî be ku di nivîsên Qura`anê de hatibe ev gotina heqîqet tune ye û pêxember pêka hinek hedîs bêjanve gotiye: “رضا الوالدين رضا الله و العاق لهما عاق الله”.. Vê yekê weke hedîseke rast dihesbînin..

Herwisa bi pêvgirêdan bi hinek ayetan, jin ku dayîke jî, çend pileyan li xwarê zilaman hesab bo hatiye kirin, ti demî bawerî bi vê yekê nehatiye kirin ku pêxember bihuşt di bin pê vê de hesab kiriye.. Weke ayetên ku basa mîrat, pir jinî, zewac, lêdana jinê û ... hwd dike..

Di rastiyê de heta niha yek ji serkaniyên tund û cihê baweriyê tune ye ku meriv bikare ji sedê sed jê piştrast be ku em dixwazin vê bo gotin û hedîsên pêxember vebigerînin, û her ev yeka jî gumanek pir zêde li cem wan dirust dike ku dixwazin bidûreçûn an lêkolîn li derheq hedîsek wiha de û şert û mercên vebêjan weke ku vebêjan ragihanndine bikin..

Heta di piraniya pirtûk û serçaveyan de çendîn navên vebêjeran tê, bi çendîn vebêj û şiroveyan, herwisa li ser hêla înternetê bi sedan û hezaran serçave ber çav dikevin, bi sedan navên din dikevin ber çavên mirov, ev yeka bilî vê ku ji aliyê zanistî ve bo lîkolînê bê encam dan, di vê serdemê de pêxember bixwe nexwendevan bûye, êdî ev hemû navên ku di axavtinên pêxember de min bas kirin, ev jî nexwandevan bûn weke Boxara ku hem nexwndevan bûye û hem jî Ereb nebûye, bi ti şêweyekê cihê bawerî û qenaetê nine ku wan gotinan weke xwe bi dirêjahiya 1600 salan berî niha veguhastibin..

Pêka ya ku niha li torên civakî de pir bi hêsanî û di her warî de destê mirov digihîşje bi çavkanî, pirtûk, gotin û şirove û lêdvanan, pir bi hûrî zivrîn bi çavkaniya vê gotinêye ku goya Bihuşt di bin pê dayîkan de ye, gihîştin bi vê yekê cem şirovekar û basgeran û rastiya vê gotinê yek alî bûye, heta bighîje gelek zanayên Îslamê li ser navê hedîsên direv rêzbendî kirine..

Basek heye ku pir dubare dibe ev yeka ye ku, goya mirovek çûye cem pêxember li bara vê yekê lidel pêxember de beşdarî di şer de bike pirs kiriye, di bersivê de pêxember jê pirs kiriye ku: Diya te maye? Zilam jî dibêje erê, wî jî bersiv daye: Diya xwe



bi tenê nehêle, bihuşt li cem pê dayîka te de ye, wate negotiye jî ku di bin pê daykê de ye, ku ev yeka jî tenê bikar anîneke nerast e, bi wateya vê nayê ku diya te be, weke ser çemandin û guhdarîkiirnê be, ev yeka bicihê şehîdbûn û çûna bihuştê ye, cara dawî heta ev gotina jî cihê baweriyê nine û gelek zanayên Îslamê ev bi drev binav kirine..

Em hemû dizanin du cure hedîsên pêxember hene, yekem jêra dibêjin hedîsa sehîh, duyem jêra dibêjin hedîsa ze`îf, ev gotina jî dikeve di rêzbenda hedîsa ze`îf de..

Ku ev yeka jî vê betal dike. Bitaybet yek ji wan ku îşare bi navê vê tê kirin, gelek caran ku hatiye bas kirin û veguhastin, Mûsa Bin Mihemed Bin Eta El_Kezab e ku her li paşnavê wî de der dikeve ku direvîn bûye..

Dawîn car dixwazim vê yekê bêjim, yaku gotiye bihuşt di bin pê dayîkan de ye, gotineke cihê baweriyê nine, bibînin ger gotin li pile û payeyên jin û dayîkê be, ev yeka axavtinek zêde dixwaze, çimkî heta ev ayetên ku bas ji jin û dayîkê kirine, mebesta wan tev jinan nine, tenê mebesta wan ji (muslimat, salhat, mo`iminat) e, wate heta di ayet û soreyan de jî cudahiyeke yekcar zêde heye, li rûyê pile û payeyên jin û dayîkan de, bixwe rêzbendîkirina bi pêka nêzîkbûna wan bi pêxember û eshabên pêxember ve bi dana berhev a wan digel zilaman e, ger wate û lêkdana wan vê hedîsê tenê destkirt be, ev jî gotineke din a zanistî ji xwe digire, ku ger wisa be di nivîsên Qura`anê de, ti gumanek di bara heqîqet û rastiyan de tuneye, ev hemû neîdaletî bi jinê re zelal û eşkere nedibûn..

# Agirê Şoreşa Jîna geştir dibe



N: Sîna Nûrî

Wek tev aliyek wê yekê baş dizanin ku rejîma terorîst a Komara Îslamî ya Îranê di heyamê 44 sal ji deshilatdariya xwe de wek jêdera hemû tepeseriyên curbicur û bingeha hemû bandeke mafyayî di bin tirsa rejîmeke siyasî de, heya niha hemû ezmûnên tepeserkirin û tawankariyên xwe yên li dijî tevgera azadîxwazî ya Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî bikar aniye.

Di wan çend mehên derbasbûyî de jî û bi taybetî Rejîmê xwast vê serhildana gelên Îranê ku bi dirûşma Jin, Jiyan, Azadî xîm û stûnên dîktatoriyeta rejîmê di bingeh de hejandiye bifetisîne, lê di têkbirina gel û serhildanê de bi ser neket.

Agirê ku bi rijandina xwîna Jîna Emînî keça bêguneh a Kurd bi canê rejîmê ket, agirê wê bi lez û bez ji Kurdistanê ber bi deverên din ên Îranê ve belav bû û hevbendiyeke şoreşgerî di navbera tevgerên civakî yên pêşvero û neteweyên cuda de çê kir.

Li Îranê û di asta cîhanî de, hevxemiyek ji bo piştevanîkirina şoreşa gelên Îranê derket. Piştî derbasbûna zêdetir ji 200 rojan bi ser şoreşa Jîna yê re û serbarê bikaranîna tev alavên tepeserkariyê bo fetisandin û vemirandina agirê vê şoreşê ji aliyê rejîma mirov kuj a Komara Îslamî re, lê em dibînin ku car din li piraniya bajarên Îran û Kurdistanê gelên azadîxwaz û bêzar bûyî ji wê rejîmê bi awayekî girseyî û organîze kirî û bi pêşengiya jinan û xurtên mafxwaz li hember wê rejîmê rawestane û berxwe didin û dengê azadîxwaziyê her roj bilindtir dibin. Ji wê zêdetir, roj bi roj agirê wê şoreşê geştir dibe. Rêbazên berxwedanê yên xwepêşanderan ên li hember rejîma Îranê, balkêştir bûn.

Têkoşîn û berxwedana gelên azadîxwaz û mafxwaz yê Îranê zêdetir ji 200 rojan li pey xwe hiştin. Her roja ku derbas dibe têkoşîna civatgeha azadîxwaz a Îran û Kurdistanê bihêztir, xîm û kela dîktatoriyeta rejîmê zêdetir diheje û şeq dibe. Her roj zêdetir dengê şoreşê xurttir û bilindtir dibe.

Çirûska azadiyê Ku ji bajarê Seqizê dest pê kir û hemû Kurdistan û Îran dan ber xwe, êdî ev çirûsk bûye agirê azadiyê ku tu desthilatek û tepesrîyek nikare vê bitemirîne û ew agirê ku wê gavê berbûye canê rejîmê, heya koka nîzamê di bingeh de neqelîne û neke rejû û ji nav nebe, ew agir natemire.

Ev Serhildana bêmînak, weke pêleke berxwedanê hemû kolan û qad û bi giştî civatgeha azadîxwaz a Îranê dan ber xwe û bi rihek yekgirtî û yek deng û yek helwêst li hember wê rejîma xwînxwar û gemar de rawestan û heya vê gavê jî berxwe didin.

Remza vê şoreşê jî bû 'Jin Jiyan Azadî' dirûşmek pir wateye ku hemû daxwazên azadiyê di nav xwe de dihewîne. Silogana Jin Jiyan Azadî hêvî, wêrekî, moral, îrade dan her mirovekî azadîxwaz, ev ruh her roj geştir dibe û bi pêşengtîya jin û ciwanên şoreşvan û azadîxwaz ên Kurdistanê bibe goristana faşîstan.

Jin Jiyan Azadî, Kurdistan dibe goristana faşîstan, Heta Kurdek bimîne, Kurdistan dê her bimîne', Em ê dîktator birûxînin, tola Jîna bistînin; Seqiz dergeha raperînê ye, tev siloganên han helwesta herî radîkal ya gelê azadîxwaz û mafxwaz yê Kurdistanê ye. Em di çend rojên derbasbûyî de û bi xasmanî piştî êrîşên kîmyayî yên rejîma Îranê bo ser 6 xwendingehên keçan




li bajarê Seqizê ku nêzî 50 dersxwan bi sedema têkçona rewşa tendirustiya wan bo nexweşxanê hatine veguhastin, şahidê bilindtir bûna car din a serhildanê û dengê azadîxwaziyê di kolan û bajarê Kurdistanê de bûn. Çanda berxwedanê her roj dengê azadiyê li kolanan bilindtir û bihêztir dike. Êdî ne bi şîn û girî, Belkî bi ruhê berxwedaniyê ku serkeftinê misoger dike, gelê me şehîdên xwe pêşwazî dike û wan bi bîr tînin û bi sirûd û awazên şoreşvanî û azadiyê li ser gora şehîdan, hawara azadîxwaziya neteweya xwe diqêrînin.

Di destpêka şoreşa Jîna yê ve heya niha bi Sedan jin, ciwan, zarok di van serhildanan de şehîd bûn. Bi rijandina xwîna her şehîdekî agirê têkoşîna azadiyê bilindtir dibe. Bi nirxên ku li kolanan tên dayîn mêr jî êdî azadiya xwe di têkoşîn û xeta rizgariya jinan de dibînin. Ev pêşketineke pir mezin û girîng e, xwe gihandina wateya jiyana azad e ku bi zanista jinan bi pêş dikeve.

Di zanîngeh û dibistanan de zanista civakî bi pêşengtiya keç û xortên ciwan digihîje wateya xwe ya rastîn. Rolê zanîngehan pir girîng bû, ruhê şoreşê parast û nehişt şoreşa gelan ji hevdu qut bibe. Ev jî nîşan dide ku hemû qat, bawerî, netewe hebûna xwe di vê formula efsûnî de dibînin. Ji xwe ev bandor, şêwazên bi wî rengî di çalakiyên piştgiriyê de derkete holê.

Bila tev aliyek û bi xasmanî dujminên Kurdan baş zanibin ku, şoreş û bahoza guherînxwazî û peşqela agirê şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" heta hiloşîna rejîma Komara Îslamiya Îranê û avakirina sîstimek demokratîk û gelî di rêde ye û yê geştir bibe û bi tu tiştekê pêşî jê nayê girtin.



# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Xoy: Kuştina jineke ciwan bi hinceta "namûsê"

Jinek ciwan a rûniştiyê gundê "Gyoran" a Xoyê ji aliyê bav û birayên xwe ve li gundê "Xezal-Axa" ya Xoyê bi hinceta "namûsê" hat kuştin.

Li gor çavkaniya Nûçegihanê Kurdpa, navê vê jina ciwan "Meryem Silêmanî" temen 28 salî ye, ku roja Înê 25'ê Xakelêweyê bi sedema peywendiya wê bi kesekî din re û belavbûna fîlma wê, û piştire ji aliyê bav û birayên xwe ve ku porên wê ditiraşin wê di-kujin.

Li gor çavkaniya haydar a Kurdpayê, fîlma Meryem Silêmanî ji aliyê hevjîna kesê ku pêwendiya wê pê re hebûye, tê weşandin û piştî vê kiryarê, Meryem dest dihavêje bi xwekujiyê lê bi veguhastina wê bo nexweşxaneyê rizgar dibe.

Çavkaniya haydar dibêje: Meryem Silêmanî bû qurbaniya zewaca kêm temeniyê ku di 16 saliya xwe de bi zilamekî bi navê Medenî re zewicandibûn û sê zarokên wê hene.

Hêjayî gotinê ye ku hemû kuştinên jinan li Îran û Kurdistanê bi mebestên "namûsê" nayên kirin, lê di salên derbasbûyî de, rewşa xirab a civakî-aborî û zêdebûna tundûtûjiyê di nav civakê de bûye sedema kuştina jinan ji ber sedemên curbicur. Ji aliyeke din ve li gor yasayên Komara Îslamî kuştina jinan ji aliyê endamên nêzîk ên malbatê ve parêzbendiya qetilê heye û can û jiyana jinan li hember yasayê ti qîmet tuneye û bi destê endamên malbatê tê spartin.

## Li Bendava ebbas Abad a Banê termê 2 kolberên xeniqî hatin dîtin

Roja şemî 26`ê Xakelêweyê, termê 2 welatiyên Kurd yên bi navên "Efşîn Felahî" temen 22 salî û "Mehdî Rehmetî" temen 23 salî û xelkê Seqizê ku di bendava Ebas Abad a Banê de xeniqîbûn, piştî 9 rojan lêgerînê hatin dîtin.

Li gor çavkaniyeke agehdar, termê van her du kolberan bi hewlên tîmên melevanî ên Bane, Seqiz, Bokan, Mehabad, Sine û Merîwanê hatine dîtin.

Vê çavkaniyê agehdar got jî: Termên van her du kolberan bo morga nexweşxaneya Selahedîn Eyûbî Banê hatin veguhestin û piştre bo pijîşkiya dadwerî hatin veguhastin.

Roja Pêncşemî 17ê Xakelêweyê ev du kolber dema diçûn kolberiyê di bendava Ebas Abad a Banê de xeniqîn.

## Urmiye; Mirina welatiyekê bi sededma derzîlêdana şaş

Roja Înê 25'ê Xakelêweyê welatiya bi navê "Zîwer Erebî" keça Emîr û xelkê gundê "Mafî Kendî" a ser bi bajarê Selmasê bi sedema derzî lêdana şaş a li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da.

Li gor çavkaniyeke agehdar, ev jin roja Pêncşemî 24'ê Xakelêweyê ji bo zayînê li nexweşxaneya Azerbaycanê ya Urmiyê de razan-dibûn û roja Înê 25'ê Xakelêweyê piştî zayînê bi sedema derzîlêdana şaş jiyana xwe ji dest da.

Zîwer Erebî 32 salî ye û du zarokên wê hene.

## Civîna lêpirsîna Refîq Selîmî li dadgeha Sinê hat lidarxistin

Roja Yekşemî 27`ê Xakelêweyê, civîna lêpirsîna "Refîq Selîmî" welatiyê bajarê Sinê ku di meha Sermaweza sala 1401`an de ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibû binçavkirin, li taya duyem a lêkolînê ya dozgeriya Giştî û Şoreşa vî bajarî birêve çû.

Di vê civîna han de ku li taya duyem a dozgeriya Giştî û Şoreşê ya Sinê bi serokatiya dadwer "Neqîzade" hat lidarxistin, "Selîmî" li hember îdiaya "Fisada Fil Eriz" berevaniya xwe kir.

"Refîq Selîmî" di heyama binçavkirinê de tenê carekê bi malbata xwe re hevdîtin pêk aniye û ji mafê hebûna parêzerê destnîşankirî jî bê par bûye.

Roja Yekşemî 9`ê Rêbendana sala 1401`an, malbata "Refîq Selîmî" ji bo haydarbûna rewşa wî serdana dadgehê kiribûn û li wir ji wan re hatibû gotin ku ew bi "Fisada Fil Eriz" hatiye tometbarkirin.

Roja Çarşemî 28`ê Befranbara 1401`an, ev welatiyê Kurd ji girtîgeha Îtila`ata Sinê bo girtîgeha vî bajarî hatibû veguhastin.

Ji bo ku îtirafên bi zorê ji wî werbigirin li girtîgeha îtla`ata Sinê de rastî îşkenceyê hatiye.

Roja Duşemî 7'ê Sermaweza 1401'an, "Selîmî" bi bê nîşandana belgeya yasayî, ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibû binçavkirin û bo girtîgeha îtla`ata Sinê veguhastibûn.

# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (444)

## Wêneyên jehrîbûna dersixwanên dibistanên Kuristan û Îranê











